

Ji Merceka Jineolojiyê Efrîn

Akademiya Jineoloji

DESTPÊK

Dema em bi perspektifa Jineoloji ya bi rêbaza li ser rastiya jinê xwe digîne heqîqetê, li ser Efrînê lêkolîn dikin, daneyên ku derkiven pêş bala mirovan dikişîne. Bi qasî ku erka Jineoloji ya damara şaristaniya demokratik lêkolîn û ronî bike heye, ew qas jî xwedî erke ku mekanîzmaya wê ya wateyî û binyadî ava bike jî heye. Li ser vê bingeh û perspektîfê lêkolîn û lênerîna Efrînê bêtir bi wate dibe.

Em bi teza ku Jineoloji, "Zanista li der û dorê jinê pêş bikeve yekemîn gava ku ber bi civaknasiyê ve bê avêtin e" ketin rê û me xwest li ser dîrok û çanda Jinê ya li Efrînê lêkolîn bikin. Em dixwazin bi rêbaza Jineolojiyê çand û dîrokê ku şaristaniya dewletî sero bin kiriye ji nûve lêkolîn bikin û rastiye ronî bikin. Dema em bi tespîta ku zanistî şiroveya wateyê ya pêşketî ye, dikevin rê û li dijî hişmendiya pozitivizminê ya ku bûyer û rûdanan ji hev perçe dike, rastiya ku her tiştî têkiliyên wan bi hevve heye esas digirin. Em berxwedana Efrînê ya dîrokî û civakî jî li ser vê bingehê û zanebûnê digirin dest. Berxwedana Efrînê bi vê perspektîfê lêkolîn dikin.

Em di vê dosyaya nûçeyê de li ser milê Efrînê ya ku damara şaristaniya demokratik ku bingeha xwe ji hêza jinê û baweriya gelan digirin rawestiyên. Di lêkolînê de em gihîştin gelek daneyên ku salnameya bajar, avakirina bajar, pergala parastinê, şopa çanda Îştare, ziyaretgehên navê xwe ji jinê girtine, çanda jiyana komînal, zimanê jinê û qada berxwedanê ya Geliyê Jinê û şikeftinan yên şopa jinê li ser heye. Li ser her buhostek ax, li ser her kevirê û li ser her dîwarekê gundekî yê Efrînê şopa çanda neolitik xwe dide der. Li pêş her malê alav û amûrek neolitik me bi dirokê ve girê dide. Çand û dîroka Efrînê ya civakî îro li dijî artêşa duyemîn mezin a NATO xwe diparêze û li ber xwe dide. Armanca vê dosyayê ewe ku bajarê herî biçûk yê Kurdistanê îro li dijî hêzên herî mezin û teknolojiya herî pêşketî ya şer çawa di ber xwe dide. Berxwedana Efrînê ya ku şifreyên şaristaniya demokratik di nava civakîbûnê û axa xwe de çandiyê, îro nîşan dide çawa li dijî dewletên şaristanî li ber xwe di ber xwe didin. Îro gelên Efrînê ku bi berxwedana xwe manifestoyê dinivîsin, girînge koka wê ya ji çanda dîrokî û civakî digire bê dîtin. Dema çanda civakî û dirokî ya berxwedana bajar bê fam kirin divê rastiya çanda jinê jî bê dîtin. Divê cewherê civakîbûna jinê bê famkirin û dîtin. Wê demê dê bê dîtin ku şerê li ser Efrînê tê

meşandin şerê li ser paradigmayê pêş dikeve. Ji ber ku agahiyên di hişmendiya şaristaniyên dewletî de hêj zindî mane, dibe sedem ku êrîş bikin. Ji ber vê yekê lêkolîna hafizeya Şaristaniya Demokratîk bêtir bi wate dibe.

Li bajarê Efrînê ku li ser hemû dar, ber, war û şopên mirovan navê jinê, çand û baweriya gelan heye, reng û çanda jinê li her derê derdikeve pêş. Di salnameya bajar, avakirina bajar, parastin, şopa çanda Îştare, ziyaretgehên li ser navê jinê hatine avakirin, zimanê jin di axivin, geliya jinê û şikeftên jinê û gelek qadên din şop, reng û ruyê jinê xwe nîşan dide. Di broşûre Ji Merceka Jineoloji Efrîn ji 5 beşan pêk tê şopa çanda jinê ya li Efrînê, bi berfirehî ronî dibe.

1- BAJARÊN JINAN ÊN DI HEDEFA ŞARİSTANIYA DEWLETAN DE

LI EFRÎNÊ ŞERÊ PARADİGMAYAN

Li Efrînê di 26'ê Çile de li pêş Şaredariya Efrînê daxuyaniyek hat dayîn. Di daxuyaniyê de gotin "Şerê li vir pêş dikeve şerê paradigmayan in. Şerê Modernîteya Demokratîk a li dijî moderniteya dewletê ye." Ji sala 2012'an heta niha li Bakurê Sûriye şer geş bû. Gelek milê şer ên cewherî û xweser hene. Yekem car piştî şerê Kobanê li şerê li Efrînê de hat diyar kirin ku ev şerê navbera paradigmayan e. Berxwedan û helwesta dîrokî û civakî piştî Kobanê li Efrînê hat nîşandan. Dema ku em li gorî vê pênaseyê tev digerin, pirsê di ferq di navbera modernîteya demokratîk û moderniteya dewletî de heye? Cudahiya avakirina di navbera Modernîteya Demokratîk û Moderniteya Dewletê de çi heye? Çavkaniyên agahiyên hişmendiya avakirina moderniteyê çiyê? Kijan paradigmayê esas digirin? Bandora van paradigmayan ya li ser jiyane çibû? Dagirkeriya Efrînê ya li pêş çavê cihanê, di nava şerê paradigmayî de cihekî çawa digire? Çima ev şer bi awayekî pir zelal xwe li wir dide der? Di helwesta gelê Efrînê ya pir zelal a xwe li dijî vî şerî nîşan dide kijan kodên dîrokî û civakî heye? Gelê Efrînê ev kodên dîrokî û civakî çawa heta îro xwe anîye û parastiyê?

Ev hewldana guhertina şaristaniya dewletî fêr dike ku pêwîste dîrok ji nûve bê şirovekirin. Li ser vê xetê şaristaniya dewletê û şaristaniya demokratîk, ango serdestiya mêrê xurt û qurnaz û têkoşîna jina bîndest a azadiyê li cihê xwe bîn rûniştin û famkirin, dê bêtir rê li pêş famkirina rast veke. Ev yek jibo nêta kesên dixwazin axa Mezopotamya bikin qada şer, bê famkirin, rêbazek baş e. Şerê îro li Efrînê tê meşandin encama vê rastiyê ye.

FAMKIRINA BERXWEDANA LI EFRÎNÊ RÊBAZA FAMKIRINA ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK E

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di tespîta xwe de got Serdema Şaristaniya Demokratîk, serdema şaristaniya jinê ye. Dîsa tespîta şaristaniya dewletî hişmendiya pergala mêrê serdest e kir. Li ser vê tespîtê şerê ku îro li Efrînê peş dikeve pir aşkere nîşan dide ku di navbera çanda mêr û çanda jinê de pêş dikeve ye. Li ser vê bingehe mirov dikare bi hêsanî bêje; welatparêzî, biryargirtina bi vîna azad, rêxistinkirin û rêgezên têkoşîn û estetîkê, rêgezên bingehîn ên îrdoziya azadî û rizgariya jinê ye îro li Efrînê bi ruh dibe û geş dibe. Efrîn mehek zêde rastî êrîşa artêşa duyemîn a NATO'yê tê. Ji hewayî û bejayî bi bombeyan êrîş dike. Li dijî vê yekê berxwedana Efrînê ku koka xwe ji dîrok û civakê digire wateya damara şaristaniya demokratîk bêtir kûr dike. Ev rêbaza famkirina şaristaniya demokratîk e. Efrîn dibe qada ku rastiya neteweya demokratîk ya bawerî û gel çawa dikarin bi hev re bijîn radixe pêş çavan, Hem jî bi berxwedana Avesta Xabûr û Barîn Kobanê yên bi zanebûna nixên jinê ya cewherên civakîbûnê tev geriyar, Efrîn ji ber vê yekê xwedî wateyek taybet e.

MUSUL, SERÊKANIYÊ, PALMÎRA, KOBANÊ, ŞENGAL Û EFRÎN

10 sal berê, bi destê El Kaide, OSO, El Nusra û herî dawî DAÎŞ'ê dagirkeriyek pêş ket. Niha jî raste rast bi destê dewletan li Efrînê dagirkeriyek heye. Ev tevgera dagirkeriyê ye. Dîsa di serî de DAÎŞ hem 3u rêxistinên çekdar ên taşeron di dagirkeriya Efrînê de taşerona netew dewletan dikan. Em dema li vê rêbaz û rastiye dinerin em dibînin ku hewldana dagirkeriya li dijî axa Mezopotamya ne dagirkeriyek ji rêzê ye. Gelek qeyd û dane nîşan didin ku şaristaniyên dewletî bi zanebûn û artêşên taybet û tevgerên çeteyan ketine nava tevgerê. Di dîroka nêzîk de jî em rastî gelek mînakên hatin. Mînak, Mûsil, Serêkaniyê, Palmira, Kobanê, Şengal û herî dawî dagirkeriya Efrînê mînakên şênber in.

Mûsil ku xwedî dîrokek taybet e di nava 3 rojan de ket destê DAÎŞ'ê. Piştî Mûsil ket destê DAÎŞ'ê li dijî axa Bakurê Sûriye dest bi dagirkeriyê kirin. Li Serêkaniyê êrîşa ewil bi destê OSO, El Nusra pêş ketin. Li Şengal û Kobanê jî raste rast DAÎŞ ketin nava şer. Li dijî van hewldanên dagirkeriyê herî zêde helwesta zelal li Kobanê hat nîşandan."

FORMULA FEDERASYONA BAKURÊ SÛRIYÊ

Tiştên li Kobanê qewimîn, hêzên netew-dewlet dixwestin bi destê DAIŞ'ê Rojhilata Navîn dagir bikin. Lê berxwedana li hember vê hat nîşandan, felekê li wan şaş kir. Pişt re berxwedanê li Minbiç, Tabka, Reqa û Dêra Zorê dewam kir û ev der ji DAIŞ'ê hatin paqijkirin. Beriya her tiştî vê berxwedanê kir ku pir adi navbera çand û baweriya gelan û girêdana erdnîgarî xûrt bibe. Her wiha paradîgma, demorkatîk, ekolojîk û azadiya jinê hişt ku tovê xwe şîn bike. Û ev yek ji bo Federasyona Bakurê Sûriyê bû formul.

Federasyona Bakurê Sûriyeyê xwe dipsêre rastiya azadiya jinê û netewa demokratîk. Qada jiyane pêşkêşî her kesê dixwaze xwe li gorî baweriya xwe bi azad îfade bike. Hêzên netewa demokratîk, baweriyên cuda û mezheb hebû xwe diparêzin. Pirjimariya netew û baweriyên bi feraseta demorkasiyek radîkal qadên xwe yê azadiyê berfireh dikin. Hemû netew, çand û bawerî bi hev re manifestoya jiyane dinivîsin. Yek ji rastiya modernîteya demokratîk û hêzên wê yê herî xûrt jin in. Çunkî wek ku Ocalan gotiye “Serdema şaristaniya demokratîk serdema şaristaniya jinê ye.”

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Ocalan komploya navdewletî pêk hat. Lê Ocalan bi esasiya yekîtiyê û paradîgma modernîteya demorkatîk komploya vala derxist. Ji sala 2011'an ve plana navdewletî bi rêxistinkirina hêzên netew-dewlet ve xwestin bi destê DAIŞ'ê bi awayekî korsan çêbikin. Pergala navendî ya hegamonîk ango şaristaniya bidewletî bi destê DAIŞ, hêzên paramîlîter û gelek kesên carek din ji nû ve xwe xwestin şaristaniya bidewletî dîzayn bikin û şerê wê dan destpêkirin. Her çiqas DAIŞ'ê rêxistinek bê aramnc bû jî lê hemû dewletan ji bo berjwendiyên xwe veşêrin biryek bi zanebûn tercîh dikirin. Armanca DAIŞ'ê ya serekî warê şaristaniya Mezopotamya Serêkaniyê, Musil, Palmîra, Şengal, Kobanê û gelek deverên din bûn. Lê berxwedana li dijî vê hat dayîn û ev jî teqez ne tesadûfî bû.

LI BAJARÊN ŞARISTANIYA DEWLETÎ ÊRÎŞ DIKINÊ ŞOPÊN ÇANDA ÎŞTAR

Paradîga modernîteya demokratîk û azadiya jinê îro hemû cîhanê li hev şaşwaz kiriye û bi berxwedana xwe bûye mînak û xwedî wateyek mezin e. Dema em di şibakeya Jineolojî de li Efrînê dinêrin jî me xwe gihand gelek daneyên bibandor. Beriya em derbasî van daneyan bibin, bajarên ku temsîla çanda neolitik dikirin, rastî êrîşên DAIŞ'ê hatin qet ne tesadûfî bû û divê viya mirov bi mînanan aşkere bike.

Serêkaniyê ku Til Xelef Damara Koka Çanda Neolotîk e, Mûsila warê Semîramîs ku navê Îştare li xwe kiriye, Palmîraya ku Zenubya lê şaristanî ava kiriye, Şengala ku damara jina berxwedêr diparêze, Kobanê ya ku malovanî ji Şaristaniya Kargamişê re kiriye û bûye warê Kubaba û herî dawî Efrîna ku bûye warê Kralîçeya Hurriyan Puduhepa, ket hedefa êrîşên şaristaniyên dewletî. Her çend li van bajaran serdestiya mêr hat avakirin jî, em niha rastî şopên baweriya Xwedavenda Dayik ji bo hebûna xwe biparêze li ber xwe dan û bûne simbolên jinên berxwedêr yê serdemê tîn. Taybetmendiya van hemû bajarên ku hêj damara berxwedêr ya Xwedavendan lê dijî, çanda Îştare û şopa aydî wê balê dikişîne ser xwe.

Ev warên ku wekî bajarên jinê navê xwe di dîrokê divîsandin, êrîşên hilweşîn, talankirin û xerakirina DAIŞ'ê ya li dijî van bajaran jî re nesadifî ye.

Bajarên Serêkaniyê, Mûsil, Palmîra, Kobanê, Şengal û herî dawî bajarê ku dewetên serdest DAIŞ ji navbera xwe derxistin û raste rast êrîşê wê kir, Efrîn, ên nûnertiya çanda berxwedêr û girêdayî koka erdnîgariya xwe ya li dijî înata dîroknasên mêrê serdest ên Oryantalîst, şop û daneyên wê çanda dewlet diparêzin. Bi berxwedana li van bajaran hat nişandan, destnîşan kir ku damara şaristaniya demokratîk çiqas bi hêz e. Di salên dawî de ev yek bi dehan caran hat îspatkirin û ev yek wê rastiyê teyyîf dîke.

Koka rihên çanda neolotîk li Serêkaniyê ya Rojava ye. Hêza çanda şoreşgerî ya neolotîk a li Tel Xelef hêza bingehîn hêza jinê ye. Çanda Tel Xelef çanda serdema neolotîk temsîl dîke. Li ser xaka Mezopotamyayê cara ewil li Tel Xelefê nûveyên serdema neolitik hat dîtin.

MÛSILA XWEDÎ MÎRASÊ SEMÎRAMÎS A ŞOPDARA ÎŞTAR'Ê

Piştî Til Xelafê DAIŞ'ê êrîşî Mûsilê kir. Mûsil di heman demê de welatê Semîramîs û şaristaniya li wir ava kirî xwedî girîngiyek mezine. Peyva Mûsil "Tevn" ku tê wateya tevnikariyê. Berî mîladê li Mûsilê, şaristaniyên pir girîng ên mîna Asur û Babîl li herêma Mezopotamyayê hatine avakirin. Li gorî gotegotan Semîramîs a di serdema Babîlan de dijiya, di vê dîrokê de navê xwe li tevnikariyê kiriye û bûye temsîla çandek wiha. Semîramîs melîkeya sûrên jorîn ên Mezopotamyayê dijî û navê wê yek ji navên Îştare ye. Semîramîs yek ji simbolên serdema berxwedêr a li dijî avakirina serdestiya zilame. DAIŞ'ê di sala 2014'an de zirarek mezin da bi hezaran peyker û nîşaneyên kevnare yê serdemê yê li Muzexaneya Arkeolojiya Nînova cih digirtin.

DAIŞ'Ê BAJARÊ ZENUBYA PALMÎRA JÎ KIR HEDEF

Jineolojî ku mîna zanista şaristiya demokratîk hat pênamekirin, ji bo xwe zanîsta dîrokî esas digire û dibêje hafizayeke bi hêz a şaristaniya dewletdar heye. Yek ji van jî mînanan Zenubya ye ku çanda jinê bi rêbazên cûda gihandiyê jinan. Ji ber ku Palmîra yek ji derbasbûnên girîng ên li ser axa Sûriyeyê, tim rastî talan û dagirkeriyên serdest ên mîna Roma hatine. Di sala 2015'an de DAIŞ'ê li Palmîrayê peykerê El Lat Aslan a berî 2 hezar sal parçe parçe kirni û balkêşe ku Perestgeha Bel jî rûxandin. Di 26'ê Çile de peykerê Aslan a li Perestgeha Êndara ya Efrîn hat bombebarankirin. Bombebaran kirin peykerê Aslan a Perestgeha Êndara û rûxandin peykerê El Lat Aslan ê li Palmîra bi hev ve girêdayîne. Gava mirov lêkolîn dike ev yek ne tesadûfe.

BAJARÊ KUBABA KOBANÊ

Tevna civaka dîrokî ya Kobanê berî B.Z. 1300 hezar sal li Kobanê, Cerablû û Babê mirov dikare xwe bigihîne şaristaniya Kargamiş. Kîbele piştî xwedevanda dayîkê ya çanda Neolîtîkê derbasî Anatoliya dibe çanda Kubaba ya Xwedavenda Dayîkê ava dike û xwedî derketin wê pir rewşedare. Kobanê ku dikave nabere derbas bûna Rojhilat û Rojava xwedî erdnîgariyek girînge. Bi taybetî danayên li Tiştîne, cardin yên li Girê Înanna û Şikefta Keçika derket holê ku divê bîn lêkolînkirin.

BAJARÊ BERXWEDANA JIN LÊ AVA BÛYÎ: ŞENGAL

Li Şengalê şaristaniya çanda jinê ku bi şaristaniya demokratîk re dibe heye. Ji bo vê yekê gelek danayên bi devkî yên çanda hatine avakirin hene. Li vî bajarî jiyana xwe bi xwazayê re rêxistin dikin. Ev bajar di dema derbasbûna şaristanyê de, malûvanî jig elek nasnameyên jina ên berxwedêr re kiriye. Yek ji van nasnameyan Dayîka Pîra Fat a ku Çanda Xwendaventiya Îştîr temsîl kiriye. Sîtiya Es, Pîrî Lîbne, Xatuna Fexra, çil jin, Sîtiya Nîsran navên herrî balkêşin. Her yek ji wan çîrokên berxwedêr temsîl dikin.

EFRÎNA KU ŞOPÊN PUDUHEPA DIDOMÎNE

Efrîn ku şopên çanda Îştîrê ya çanda bingeheîn a civaka Neolîtîkê dinava xwe di hewîne, di heman demê de şopên çanda Hurrî û Mîttaniyan a Aryen a Rojhilat jî hîna li Efrînê xuya dikin. Ev gelên B.Z. di sedsala 17'emîn dewletên Mîzzuwatna û Mîttanî avakirine. Puduhepa B.Z. sedsala 13'emîn jiyaye. Bavê wê Kîzzuwatna ji

Lawanzantiya yê ye (tê texmîn kirin ku nêzî ciheke Elbîstanê ye.) Di danayên dîrokî de jî tê gotin ku Lawazatiya bajarê Îştar/Sauşga ye. Puduhepa xwe weke xizmetkara Xwedavenda Hepat a Hurriyan dibîne. Puduhepa hemû tabletên nivîskî yên çand û ola Hurrî ya bajarê xwe Kizzuwatna û Hattiyân bi kopî kirine. Li Hattuşa arşeveke Kizzuwatna û pirtûkxaneyek ava kirine. Dewletên Mîtanî û Kîzzuwatna, B.Z. di sedsala 12'emîn de esîlên Aryan ên Rojava ku ji Rojava hatin heya "Koçberiyên Gel ên Ege yê" li herêmê desthilatdariya xwe ya siyasî nêzî 500 salan parastine. Ji ber vê yekê di gelek navên herêmkî yên vê herêmê de, heta navê Efrînê jî, di etîmolojiya Ariyaca ya Rojhilat de heye. Navê Puduhepa bi Hurriye. Peyva Pudu koka xwe ji Huriya lêker digire. Hepa jî navê Hepat a ser xwedevanda Huriyane. Em ê derbarê van hemû serdemên li Efrînê hatin jiyîn de, di dosyayên xwe yên pê de bi berfirehî binivîsin.

2- BAJARÊ KU CEWHER WÊNEYÊ RÛYÊ WÊ YE: EFRÎN

Bajarê Efrînê ku navê wê li ser hemû qadên xweza, dîrok, jiyân û civakê xuya dibe, cewherê wê di wêneyê ruyê wê de ye. Yekane bajarê ku rû di cewher de û cewher di rûde xuya dibe ye. Efrîn, li gorî pergala salnameya 9 ziyaretên bi navê jinê tên nasîn a ji 90 gir, 7 gelfî, 7 bajarok û her bajarokek jî 52 gund girêdayî wê pêk tê hatiye avakirin.

Efrîn, yekane bajarê ku cewherê wê di wêneyê ruyê wê de xuya dibe ye... Li Rojhilatê xwe zexmiya kevirê reş û bereketa axa wê balê dikişîne ser xwe. Ji ber vê yekê li her malekê kevirê reş ê bi qul ku remza pîrozî û oxirê ye daliqandiye balê dikişîne ser xwe. Kevirê reş, di serdema civaka neolitik de ruh û can dide civakê. Di dîroka wê de tevî xwezaya wê remza berxwedanê heye. Jin jî, ji îna hemû hişmendîya bedenê re xweşîkbûna çanda neolitik vedibêje. Zarokên wê şahî û xweşîkbûnê dineqîşîne. Di mênên wê de jî rastî şopa mênê naif, "camêr" tê xuyakirin. Axa wê jî naza hemû giha û nebatan di xwe de vedihewîne... Di ax, dar, ber û hemû mirovên wê de şopa damara berxwedêr ya Xwedavendan xuya dibe.

HEMÛ WATEYÊN NAVÊ WÊ DI AVESTA RE DERBAS DIBE

Di hemû wateyên navê peyva Efrînê de şopa xweza, dîrok, jiyân û civakbûnê heye. Peya Efrîn bi zimanê Aryanî "nimet, tevazu; di beşa Pazand a pirtûka pîroz a Avestayê de jî di duayên eleqeyî nahmet de wateya bereketê ye. Dîsa di Avesta de di duayên taybet de tê gotin ku di merasimên ku agirê pîroz bejna xwe tewandiye de navê wê derbas dibe. Bi awayekî etimolojîk peyva Efrînê di heman demê de koka

xwe ji peyva xelat û beraketê ye. Tê gotin ku koka peyvê ji olê Zerduştîyê tê. Li gorî gote gotan, di serdema Tufana Mezin de Pêxemberê Nuh, dema ava tufanê kêm dibe, ji ser guvertêyê kevokek sipî difirîne. Piştî kevok bi çiqilê dara zeytûnê ku xistine nava nikilê xwe paşve vedigere. Li ser vê yekê Peygamber Nûh fam dike ku ava tufanê daketiye. Ji ber vê yekê kevoka sipî û çiqila zeytûnê wekî remza aşîyê tê zanîn. Bajarê Efrînê wekî yekem wargehê Zeytûnê tê zanîn. Ji ber vê yekê çiqilê dara zeytûnê pîroz e. Ji bo xwedavend û xwedayên Yunan çiqila dara Zeytûnê wekî taç li ser vê hişmendiyê dihat diyarîkirin.

EFRÎN, AFIRANDIN, AFRAT, AFRODÎT...

Jineolojî, di rêbaza lêkolîna xwe de hem daneyên civakî û hem jî belgeyên dirokî ji bo xwe çavkaniyên bi qîmet digire dest. Der barê peyva Efrînê de dayikek pîr pênaseya "afirandin, ji peyva afrandin, afratê pêk tê" dike. Ji ber vê yekê bi qîmet û pîroz e. Dayik dîsa ji bo peyva Afrat jî diyar dike ku bi zimanê Soranî jin afrat e. Ji Afirandinê tê. Diyar dike ku demek ji demekê Xwedavend Afrodît di vê axê re derbas bûye û navê xwe ji "Efrîn dît" tê. Ev jî şînad dide ku çanda Afrodît bi çanda Îştâr û Înanna re bûye yek û bi riya Fenikeyan derbasî Şaristaniya Yunanan bûye. Afrodît di heman demê de xwedavenda ku Troyaliyan diparêze. Her navekî ku li Xwedavendan tê kirin, taybetmendiyên gerdûn, civak û xwezayê di nava xwe de diparêze. Pênaseya nav di nava xwe de têkiliya jiyar, civak û jinê bi hevve girê dide.

Herêma Efrînê wekî herêm jî bi navê Çiyayê Kurmanç, Cumê, Efrîn û Avrin bi gelek navên cûta tê nasîn. Herêma Efrînê di dîrokê de her dem wekî qada berxwedana kurdan hatiye nasîn. Bûye qada berxwedanê. Kurdên ku li vê herêmê dijîn, ji bo vê herêmê Çiyayê Kurmanç an go Çiyayê Kurmênc pênase dikin. Osamî wekî Kurddag, Erebi wekî Cebel-ul Ekrad (Çiyayê Kurdan) pênase kirine. Rewşenbirên li Efrînê jî diyar dikin ku Efrînê navê xwe ji ava Avrînê girtiye.

Pêşî li erdnîgariya xwe estetîka berxwedanê çê dike... Kodên asîmanan diguhezîne Efrîn... Îlhamê ji stêran yanî ji çanda Îştârê distîne. Mînak, 90 girên wê yên hêleke wan li Keleha Jinan hêleke wan jî li Keleha Semanê dinihêre hene... Di biniya wan girên ku li hember hev, Efrîn hem dîroka xwe diparêze hem jî li hemberî talûkeyan hevdu hişyar dike... 9 ziyaretên ku 90 girên girêdayî wan in, bi navê jinan e. Ji van ziyaretan hin jê li Geliyê Jinan hin jê jî li Şikefta Jinan dinihêrin...

Ji ber li her gundeke wê ziyaretek heye, şopên anîmîzmê ku zanista civaka xwezayî ye di xwe de dihebîne. Ev ziyatre jî girêdayî van 9 ziyaretan e û ji ber vê ziyaretmn

din jî bi navê jinan tên bilêvkirin û ev yek jî nîşan dide ku demarên berxwedêr ên civatê hatine parastin. Mesela li Qastella Cindoyê Ziyareta Porsa Xatûn û li Mabada Xilnirê jî Ziyareta Keçika Kej mînak in.

Ji ber Efrîn li gor salnameyê ava dibe... mînak 7 geliyên wê hene. Geli Tito, Geli Heştir, Geli Xezal, Geli Çil Kanî, Geli Zete, Geli Haydo û Geli Tiyro. Her geliyek xwedî çîrokek e.

7 navçeyên Efrînê hene. Girêdayî her navçeyê 52 gund hene. Bi giştî 365 gundê wê hene. Paşê ev hejmar geh zêde dibe geh kêm dibe. Yanî carinan heta 366'an jî diçe; yanî dema du gund bibin gundeke an jî gundek bide du gund... Li Efrînê estetîka berxwedanê di wateyên ku hatine parastin de veşarî ne... Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, her çî qas hejmara navçe û gundên girêdayî polîtîkayên nifûsê biguherin jî navçeyên Efrînê ev in: Cindiresê, Reco, Bilbilê, Şêra, Mabeteta û Şiyeyê ne. Şêrawa qada Çiyayê Lelûnê ye. Cihekî nêzî Efrînê ye. Paşê daxilî navçeyan bûye.

Li Efrîna ku hema bêje her tiştek xwedî wateyek e, li her deverên wê cihwarên pîroz hene, darên pîroz, kevirên pîroz hene. Ziyaretên wekî Nebî Hûrrî (Keleha Hûrrî), Ziyareta Henên, Ziyareta Evdirehmên, Ziyareta Şêx Berekat, Ziyareta Çilxanê, ziyaretên Mena û Deyanê. Kaniya Turindê û Ava Golbehîrê jî avên wên pîroz in. Li Ziyareta Henênê goa-ra Nûrî Dêrsimî û hevjinê wî Ferîde hene. Li Qibalê sê ziyaret hene; Ziyaretên Şêx Berekat, Gundî Dereza Qastella Porse Xatûnê; li gundê Hecî Xelîl ê navçeya Recoyê Ziyareta Mihemmed Elî û li Şerayê jî Ziyareta Karecoranê heye.

DI NAV ÇAR ÇIYAYAN DE YE

Efrîn wek Dêrsimê di nav çar çiyayan de ye. Piştî xwe daye çiyayan û li serê stran hatine vegotin. Bajarekî hunerî ye. Li vir Çiyayê Çil, Çiyayê Lelûn, Çiyayê Xastiyan û Çiyayê Hawarê hene. Çiyayê herî bilind Çiyayê Hawarê ye. Ev çiya li bakûrê bajêr e. Di heman demê de cîranê Bakurê Kurdistanê ye. Li rojhilat ve eşîra Şikakan û li rojava jî eşîra Amka ku lê dimînin digîhîje Çiyayê Xastiyan. Li hemberî van her sê çiyayan jî çiyayê Lelûn heye. Li ser çiyayê Lelûn şifreyên baweriya Rojê veşartî ne û çiyayek ji baweriyên xurt re malovaniyê kiriye.

Dîsa 7 eşîrên Efrînê hene. Eşîra Amkan ji Bilbilê heta Recoyê, eşîra Biyan li Bilbilê, eşîra Şêxiyan li Reco, eşîra Xastiyan jî li Mabetê, eşîra Cumiyên li Cindiresê, eşîra Şikakan li Şêranê û eşîra Robaran jî li Şêrawan e.

LI HER DEVERÊ MÎRATEYA ÇÎROKA ÎŞTAR HEYE

Her bihostê li ser vê axa mîrateya Îştar lê heye. Li ber deriyan ji bo xêr û hêviyan nal, kevirên kunkirî, destar û bermahiyên dişibin van tiştan balê dikişîne ser xwe û taybetmendiyên Efrînê ne. Dîroka Girê Eyn Darê navê berxwedana Girê Cindirêse ye. Şêrewa Çiyayê Lelûn. Bilbilê Nebî Hurrî, Şêra Eyn Darê mîrateya çîroka Îştar diparêze. Host bi host li her deverê vê axê şopên berxwedanê di nav xwe de vedişêre.

LI RECO KEVIRÊ BÛKÊ

Ji Reco re Rajû û Rajûû jî tê gotin. Wateya wê bi kurdî ye ji raçandin û çêkirinê tê. Reco li ser herî cihê bilnd ê Çiyayê Hawarê cih digire û li her gundê Reco bandora çanda Îştar û Zerdeştî heye. Reco bi çanda xwe ya balkêş çavê her kesî dide ser xwe. Riya trêne ya Berlîn û Bexdayê jî di Reco de derbas dibe. Xwedî çandek dewlemend e. Gundên li herêma Reco yên Hec Xelîl, Etmana, Maseka, Mûskê, Hopka û Banîkê li benda lêkolînê ne.

ÇÎROKA KEVIRÊ REŞ BALKÊŞ E

Di heman demê de Reco wek Çiyayê Bîlalê Hebeş jî tê nasîn. Çîroka Bîlalê Hebeş dişibe çîroka pêxemberê îslamê Hz. Muhammed ya Çiyayê Hîra. Tê gotin ku Bîlalê Hebeş 40 roj û 40 şev li vir hûr û kûr dibe û di encamê de xwe bi Hz. Muhammed re dike yek. Ziyareta Mihemed a li gundê Hec Xelîl vê çîrokê di nav xwe de vedişêre. Her wiha li Recoyê Çeqmaqê Mezin ku jê re tê gotin, li pişt Reco ye û dibêjin ku cihê kevirê reş li wir e. Dibêjin ku di hundirê wî kevirê reş de berhemek (sir) heye û pê tê bawerkirin. Tê bawerkirin ku marê reş wir diparêze û ji bo mirov xwe bigîhînin wî kevirê reş ewil mirîşkek reş berdîdin. Li gorî rîwayetê dibêjin ku ew mirîşk heke ku nemire xwe digîhînin wî kevirê reş.

Disa Kevirê Bûkê jî heye û li Geliyê Tiyro ye. Gelfî girêdayî Reco ye. Çîroka vê deverê heya Hz. Alî û Fatma Nebî diçe. Li gorî rîwayetan Fatma Nebî dibîhîze ku dê Hz. Alî hêwî bîne ser û li dijî vê yekê derdikeve. Dema nikare ji vê re bibe asteng ji bo savar bêjin bike bêjîngê dide destê xwe û ber bi jor ve derdikeve. Bavê Fatma Nebî wê dibîne û dibêje “Tu diçî ku?” ew jî bersiv dide û dibêje “Min dît, bila dijminê min nebîne” û pişt re dibe kevir. Her wiha li gorî rîwateyek din jî tê gotin ku jinek li dijî zewaca bi darê zorê derdikeve û dibêje “Li şûna ez ê bibim ya wî zilamî, ez bibim keviyek baştir e” û pişt re dibe kevir. Li gundê Bililko jî mozaîkek heye. Li ser mozaîkê

wêneyên hesp, werdek û fatfatokê hatiye neqş kirin. Li gundê Hecî Xelîl ê bi ser Reco jî balkêş e ku tenê malbatek ermenî dijî.

LI MABETA ZIMANÊ TENÊ JIN PÊ DI AXIVIN

Li navçeya Mabetê herî zêde Elewî lê dijîn. Du malbatên ji komkujiyan direvin vê navçeyê ava dikin. Li vê derê ji bo kes ne zane Elewîne, perestgehekê ava dikin û tê îdîakirin ku navê Mabetê ji vê perestgehê tê. Ji gundê Şeytana heya gundê Zehra, ji gundê Sarya heya gundê Amara yê Mabetê wateya her gundekê heye. Mînak li gundê Zehra, her roja çarşemê hemû welatîyên gund li hev kom dibin, xarinan çêdikin û wê rojê bi hev re derbas dikin. Gundê Dumîlya ya girêdayî Mabetê jî gundê gundên Kirmancane. Li vî gundê bi zaravayên Kurdî û Kirmancî diaxivin. Li gundê Şeytana jî mirov rastî vegotinên xeta berxwedana jinan tê. Li Şeytana jî, ji tevnekariyê bifikirin heya çêkirina qûndireyan, ji çandiniya wê birin heya perwerdê, jiyaneke komînal hatiye avakirin. Li gundê Sterkê jî şopên çanda Îştîtar tînin. Balkêşe ku di her malekê de çîroka Şahmaran û wêneyê teyrê Tawus heye. Gundê navê Sarya ku tê wateya jinên li hespan siwar dibin, lê hatî kirin jî pir balkêşe. Navê jineke ku ji bo azadiyê canê xwe feda kiriye li gundê Sarya hatiye kirin. Em yek di gotegotan de jî tê gotin. Gundê Behdînî jî, ji aliyê sê malbatên ji Colemêrgê hatin ve hatiye avakirin.

Jinên gundê Ruta yê Mabetê, zimanekê ku tenê jin fam dikin, diaxivin. Yek ji mînakên zimanên jinan ên li herêma Hewreman a Rojhilatê Kurdistanê û Çînê ku tê axatin, li Gundê Ruta ya navçeya Efrînê tê axivîn. Ev ziman mîna zimanê çûkan jî tê pênase kirin. Lê tê gotin ev ziman ne zimanê çûkane zimanê jinan e. Gava em pirs dikin “Çima pêdivî bi zimanekê wiha dibîn in” bersiva “Ji bo em li dijî zilamtiyê xwe biparêzin” didin. Pêdivî heye ku ev ziman jî bê lêkolînkirin.

GELIYÊ QÎZIKA, QELÊYA QÎZIKA Û ŞIKEFTA QÎZIKA YÊN LI BÎLBÎLÊ

Şikefta Qîzikan, Newala Qîzikan, Qelêya Qîzikan û Şikfta Bûkê yê li gundê Hasandêra navçeya Bîlbîlê pêwîste ku bînin lêkolînkirin.

Tê gotin ku çîroka wê ya berî 5 hezar sal heye. Tê îdîakirin ku ev çîrok ji serdama Şemsun tê. Tê gotin ku Şemsun an Yahudî yan jî Romane. Tê îdîakirin ku Melek Şemsun mesiye. Gotegotinên cûda ji ser Şemsun hene. Di serdema Fransiyan, di ketina Şikefta Qîzikan de, wêneyê heyî tê şandin. Cardin Qelêya Qîzikan li vê derê ye. Gelek şikeftên baregehan li vir hene. Diyare ku mekanê berxwedanê ye. Derbare

şikeftan de zêde agahî tune ne. Tê diyar kirin ku di Şikefta Bukan de jî cin hene, lê ji bo parastina vê derê ev yek tê gotin.

LI ŞÊRAWA ÇIYAYÊ LELÛN Û 40 GUNDÊN KEVNAR

Çiyayê Lelûn, cih û warê Êzîdîyan e. Efrîn, bi gund, perestgeh, keşîşxane, ziyaretgeh û çavkaniyên xwe yên ku ji gelek şaristaniyan re hembêza xwe vekiriye û bi tîpa “B” ku wateya pêjn-ferasetê pêş dixê yek ji perçeyê bihiştê ye. Efrîn di heman demê de yek ji war û bendera çanda ku ji dîrokê heta îro damisiliye ye. Bajarê xwedî gundên Çilkanî, Çilmêra, Çilxane yên efsunî ye.

Çiyayê Lelûn yê ku li Rojhilatê Efrînê ye, cih û warên ku eşîrên Robaran û Şêrewan lê dijî ye. Li vî ciyayî Keleha Semanê ango bi navê din Keleha San Simounê ye. Li Bakurê Rojhilatê Efrînê jî Keleha Nebî Hurrî heye. Ewropî jî ji vê derê re dibêjin Sîrûs. Li nêzî vê kelehê li ser çemê Efrînê pirek dîrokî û kevnar hatiye avakirin. Beriya (deşt) Cûmê jî li vê herêmê ye. Gelek şop û girên ku çand û dîroka mirovahiyê ne, li vir xwe nîşanî me didin.

Der barê navê Çiyayê Lelûn de gelek çîrok û gote got hene. Di pirtûka pîroz a Cûhûyan Tevratê de wekî Çiyayê Nabo derbas dibe. Ji bo Nabo jî dibêjin “Pêxemberê aqil”. Nivîskar Mervan Berekat, têkildarî navê Lelûn diyar kir ku navekî bi kurdî ye. Li gorî nerîna Bereket tê wateya halê xam ê liba (heb) Zeytûnê. Li gorî hin gote gotan, peyva Leylan a ji “xeyal û serap” tê. Li gorî hin gotinan jî navê Lelûn, navê xwe ji peyva Lalan ku tê wateya Sozin digire.

Beriya Lalan a nêzî gundê Kefir Nabû jî navê xwe ji vir digire û vê fikrê bêtir piştrast dike. Ji serdema Beriya Zayînê (B.Z.) sedsala 9'emîn heta Piştî Zayînê (P.Z.) sedsala 2'yemîn Ezdan Şerawan ên li vê herêmê bi cih bûn yek ji niştecihên diyarker e. Çiyayê Lelûn di heman demê de wekî Çiyayê Seman ango Çiyayê Simoun jî tê zanîn.

LI ÇIYAYÊ LELÛN 85 ÊZIDÎYAN HENE

Li seranserî Çiyayê Lelûn ji gundê Qibaleheta gundê Qimare heta sala 1935'an 85 gundên Êzîdîyan hebûn. Lê piştî polîtîkayên komkujîyê di navbera gundan de qutbûnek çê bû. Ji ber polîtîkaya komkujîyê hêjmara gund û êzîdiyên li van gundan dijîn pir kêm bûn. Ji ber ku cih û warên Êzîdîyan li Çiyayê Lelûn hene, fikra; dibe ku peyva Lelûn aydî çand û nîrxên Êzîdîya be tîne aqilan. Li gorî hin gote gotan tê diyar kirin ku ev peyv koka xwe ji peyvê Lulu, Lelu, Lelû, Leyl ku tê wateya qalikê bahrê.

Qalikê bahrê di nava çanda Êzîdîyatîyê de cihekî pîroz digire. Ji çîroka hebûna mirov heta çîroka parastina mirovan gelek gote got li ser vê mijarê tên gotin.

Gelek gundên ku li ser Çiyayê Lelûn hatine avakirin, bûne dergûşa şaristaniyê. Ji ber bûne dergûşa şaristaniyê gelek caran rastî êrîşan hatine. Her çend dîroka van gundan heta Beriya Zayînê (B.Z.) sedsala 1-2'emîn dirêj bibe jî li gundên vê herêmê gelek berhem û çavkaniyên ku mirovan dibe çanda neolotîk derdikevin pêşberî me.

Gundê Qibalê yek ji van gundan e. Warê êzidiyan e. Peyva "Qibale" di nava kurdan de weke peyvek alîkarî û piştevaniyê tê nasîn. Her wiha tê wateya parvekirinê jî. Li gorî vegotina çanda herêmê Kîbele jî ji Qibalê tê. Çilxanê jî li vê derê heye û li berê jî darek hêviyan heye. Balkêş e ku li vir cihê ku keviran bi dîwar ve dizeliqînin, cihê findan, kaniya avê û şopa marê reş têde derbas bûye, hene. Dilop ji dîwar diniqûtin. Baweriyek wiha heye dibêjin dema mirov destê xwe bide dilopan dê kaniyên avê biçikin. Li gorî gotegotan, ên destê xwe didinê, jinên zarokan dimêjin bin, rewş diguhere. Jinên bûne mijara gotinê dema destê xwe didin dilopan ji wan re dibin şîfa.

Her sal ji ji Çilmêra Şengalê tên Çilxaneyê tewaf dikin û vedigerin. Îşareta xac a li ber derê vê ziyaretê bale dikişîne ser xwe. Tê gotin ku ev îşaret remza baweriya êzidiyan e.

Tê gotin ku di bin girê Qibale de bajarek mezin heye. Li gund şopên şoreşa çandiniya gund hene. Xweşikiya vê deverê jî mirova dilşah dike û bala mirov dide ser xwe. Malên du qatî, îbadetxane, dêr, mêvanxane, navendên rûnê zeytûnan tê hilberandin, peyker...

GUND BI TÎPA 'B' DEST PÊ DIKIN

Li Şêrawa navên gelek gundan bi tîpa "B" dest pê dike. Heke ku em navê çend gunda rêz bikin; Basûtê, Batût, Bafirîn û Basilê. Ev çend ji wan gundan in. "Ba" tê maneya pêjnê. Simbil, tav û teşeyên gilover liv an gundan hene. Ev tişt li gorî baweriya Zerdeşt in. Gundê Basufanê jî 4 kîlo mîtro ji Keleha Seman dûr e. Êzîdî lê dijîn. 360 malê gund hene. Dîroka wê Beriya Zayînê heta 700'an dirêj dibe. Basufanê yek ji gundê xwe parastiye.

GUNDÊ BERADÊ

Yek ji wargehên jiyane gundê Beradê ye. Gundê herî mezin ê Çiyayê Lelûn e. Gelek bermayiyên dîrokî yên cuda li vî gundî hene. Îbadetxaneyek pîramît, di bin de jî îbadetxaneyek û malek heye. Manastira Azîz Julianus (P.Z. 399-402) li vî gundî ye. Li bakurê gund dêrek çargoşe a di 561'an de hatiye çêkirin heye. Gora şexsiyetek Mar Maron ê xirîstiyani li vir heye û ji ber gorê girîngiya gund zêde bûye. Ev der bûye navenda mezhebê Maronî û di nava demê de ev der bûye ziyaretgeha yên ji vê mezhebê bawer dikin.

DÊR DAYIKA MERYEM

Gundê Barjaka ango Burj Suleyman 26 kîlo mitro li bakurê rojavayê Helebê dikeve. Dêra di sedsala 5'emîn de hatiye avakirin û yek ji dêrên herî xweşik ên Bakurê Sûriyeyê Dêra Dayika Meryem jî li vir heye û bala derdorê dikişîne ser xwe. Gelek cih û warên din ên dîrokî jî li gund hene.

Gundên Xalta, Qarmîtlik û Marate jî di nav gundan de cih digirin. Li van her sê gundan jî Çilkanî, Çilmêra, Çilxane hene. Li gundê Maretê çanda dewlemend a neolîtîk jî bala mirovan dikişîne. Li ber derê her malê kelûpelek ku şopa serdema neolîtîkê li ser xûya dike.

PERESTGEHA DÊRMIŞMIŞÊ

Gundê din jî Dêrmişmişê ye. Ev gundên ji serdema Hurrî, Hîtî, Aramî, Bîzans, Roma û Osmaniyan heya roja îro hatine parastin, di warê çandê de bal dikişîne ser zanebûna dîrokî ya gelan. Di vî warî de Perestgeha Dêrmişmiş lêkolîn kirin xwedî nirxek girîge. Ev perestgeha ku banê wê tune, şopa hemû şaristaniyan bi taybetî jî ya çanda neolîtîkê dinava xwe de dihewîne.

Keleha Seman a dikeve aliyê Çiyayê Lelûn ê Gundê Kimarê jî xwedî şopên girîng ên dîrokî e. Gundê Kimarê binecihe Êzidiyane. Li ser deriyê dêra di ketina gund de du motîfên teyrên tawus hatine nexîşkirin û di nava vê de sembolen zêdek (+) û rojê cih digirin û ev her du simbol îşaretê bi baweriya li ser vê axê dikin.

Xirabşems jî yek ji binyadên girîng ên Xrîstiyana ne. Tê texmîn kirin ku ev binyad di serdama sedsala 4'emîn de hatiye avakirin. Navê wê weke Dêra Bîzans jî derbas dibe.

Dêra Semaan jî li Sûriyeyê, dêra herî bi navdare û yek ji dêrên herî kevnare yên li cîhanê ye.

Dêra Fafetîn jî ku nivê wê xerab bûye, koka wê heta P. Z. 372 sal a serdema Romayê diçe û yek ji dêrên herî kevnareye.

Bineciha Kefir Kira jî di sedsalên 4'emîn û 6'emîn de hatiye avakirin û li vê binecihê şopên Xirîstiyantiyê hene.

Bineciha Kir Nabo jî B.M. sedsala 9'emîn cih û warê Asuriyan bû û li gund Perestgeheke Roma ku veguherandine Dêrê heye. Li gund jîngehên berî sedsalên 5'emîn û 6'emîn ku baş hatine parastin hene.

Keleha Kalota û resenên dêran, Piştî Zayînê (P.Z.) sedsala 2'yemîn de weke perestgehek Roma hatibû avakirin. Piştî derbasî Xirîstiyantiyê bû, dêr di sedsala 5'emîn de vuherandin dêra çargoşe. Dêr di encama şerê dinavbera Împaratoriyên Bîzans û Hemedaniyan de, di sedsala 10'emîn de vediguherînên kelehê. Li cem kelehê dû dêrên baş hatine parastin, hene. Yek jê dêra rojhilat a di sala 492'an de hatiye avakirin û ya din jî dêra rojava ya di sedsala 6'emîn de hatiye avakirine.

Mushabbak Dêra Çargoşe jî ku di nîveka sedsala 5'emîn de hat avakirin, nêzî 470 sal hat parastin.

Gundê Sugane, malûvanî ji du gundan û depoyên avê yên kevin re kirine.

Gundê Surganya di sedsala 6'emîn de hatî avakirin, şopên binecihên Bîzansiyan dinava xwe de dihewîne.

Dêra Seman jî li vê qadê xwedî girîngiyek mezin a binecihêye. Ev dêr Berî Mîladê (M.B.) sedsala 5'emîn de hatiye avakirin û heya roja îro yek ji cihên Xirîstiyân mîna Hecê bikar tînine.

Kefir Lab, Kefir Nebo, Kalûtê, Birc Heyderê, Batuta, Bazihê, Keşîşxaneyê Benastur, Dêr Amman, Dêr Turmanin û gundên Kefir Lusein, Qatura, Set Al Roum, Taqla û Zarzita gundên kevnarene. Pêwîstî heye ku li ser van gundên kevnare lêpirîn û lêkolînên pir kûr bên kirin. Ev beşeke biçûk a lêkolînê ye û hin daneyên derbarê dîroka Efrînê deye. Li vê herêmê gelek çîrokên veşartî hene ku bên ronî kirin.

HEQÎQETA LI GIRÊ EYN DARA, ŞIKEFTA DU DERÎ Û CINDERÊSE VEŞARTÎ

Lêkolînên ku li ser Efrînê hatine kirin bi sînor bin jî, me dibe heta ser şopên serdema neolitik. Li vir neandartalên şikeftên herî kevn ên Şikefta Du Derî, Eyn Dara ku wekî Strargeha Îştare tê zanîn û TSK'ê ew bombe kiribû, Cindirêse ya bandora çanda Til Xalaf li ser heye û Nebî Horî mohra gelek şaristanan heye.

Bajarê Efrîn ku hem bi erdnîgariya xwe û hem jî bi dîroka xwe balê dikişîne ser xwe, ew qas jî bi berxwedana xwe ya jinê balê dikişîne ser xwe. Gelek daneyên ku mirovan digîne serdema neolitik hatine destxistin. Li ser vê yekê gelek lêkolîn jî hatine kirin. Di lêkolînên li ser Efrînê de şopa serdema Paleolitik û mezolitik hêj bi awayekî zindî xwe diparêzin. Dîsa dane û şopên serdema çand û şaristaniyên Hurrî, Mittani, Roma, Bizans û Osmaniyan gelek zêde xwe didin der. Ji her şaristaniyekê çandek û mohrek heye.

Her çend li ser Efrînê gelek kolandin û lêkolîn hatibin kirin jî di dîroka fermî ya li ser herêma Efrînê gelek agahiyên kêmtir hene. Heyetek koma lêkolînê ya ji Sûriye û Japon, li ser serdema paleolitik û mezolitik lêkolîn kirine û hin dane bi dest xistine. Di lêkolînên li ser Şikefta Du Derî, Stargeha Eyn Dara û Girê Cindirêse de, gihîştine agahî û encama ku dîroka herêmê ji serdema paleolitikê hatiye.

NEANDERTALA HERÎ KEVN, LI ŞIKEFTA DU DERÎ YE

Cihê herî girîng yê aydî vê serdemê Şikefta Du Derî ye. Ev şikeft, 15 kîlometre dûrî navenda Efrînê ye. Nêzî Birc Ebdola ye. Şikeftek gelek mezin e. Mezinbûna wê 50 m. fireh×15 m. dirêj×10 m. bilnd e. Du deriyê wê hene. Di sala 1989'an de heyetek şapon hatin li vir lêkolîn kirin. Di lêkolînan de rastî şopa serdema paleolitik û mezolitik hatine. Amûrên kevir ên serdema Paleolitika navîn li vir dîtin. Hestiyê nêzî 70 mirovî li vir dîtine. Testîp kirin ku ev hestî aydî mirovê Neandertal (Homo neanderthalensis) in. Hestiyê dişibin van hestiyên li Herêma Kurdistanê Federe li Şikefta Şanidar jî hatine dîtin. Lêkolîna di sala 1993'an de li vê şikeftê hat kirin, neandartal ê aydî zarokê du salî ye. Li ser şeklê sekna wî ya dirêjkirina zarok, vekirina destê wî, milê xwe yê badayî hêj lêkolîn tên kirin. Di sala 1997'an de neandartalê zarokê dih hat dîtin. Dîsa li şikeftê daneyên aydî Natufiyên (10 hezar sal B.Z.) û serdema Kebarî hatin dîtin.

Li Bakurê Rojava, nivîsên serdema 9 sal P.Z. û di serdema sedsala 8'emîn de mahe hatin dîtin. Gelek perçeyê nivîsê hatiye xerakirin. Tenê beşek ji ruyê wê maye. Fîgûherê Xwedayê Teşup û li pişt milê çepê çend nivîs heta îro xwe parastîye.

PERESTGEHA ÎŞTAR ANGO EYN DARA YA BI GIRÊ STÊRK HATIYE PARASTIN

Perestgeha Eyn Dara, yê li teniştâ girê Sterk ê li Efrînê hatiye avakirin, tê gotin ku Beriya Zayinê di salên 1300 û 700 salan de hatiye avakirin. Her çend teqez neyê zanîn ku ev perestgeh ji bo kê hatibe çêkirin jî, li gorî teoriyan, te gotin ku ev perestgeh û stargeh ji bo Xwedavenda Bereket, Evîn û Şer Îştare ku navê wê di mitolojiyê de derbas dibe, hatiye avakirin. Tê gotin ku di sedsala 1'emîn a Beriya Zayinê (B.Z.) ji aliyê Aramiyan li Sûriye hatiye avakirin. Perestgeha Eyn Dara ya di nava bîrdariyê herî girîng de cih digire, di 26'ê Çileyê 2018'an de ji aliyê TSK'ê ve hat bombesirin. Ji ber vê bombekirinê vê perestgeh û stargehê zerake mezin dît. Pêpelokên ku ber bi perestgehê ve dadikevin, îro perçe perçe bûye. Peykerên sewalên bi bask ên ji kevirên reş ên bazalt hatibûn avakirin perçebûne. Ev fresk tev bûne kaviil û wêran bûne û êdî nayên nasîn. Ev perestgeh yek ji muzeya serdema neolitik û çanda Îştare maye. Dîsa mînaka mîmariya çand û ola Suriye-Hititan e. Ev perestgeh, di nava war û perestgehên Efrînê yê ku herî zêde li ser lêkolîn bihata kirin û dîrok ronî bikaraya de cihê xwe digirt.

EMANETÊ 3 HEZAR SALAN

Şopên gelek serdeman xwe li Girê Eyn Dara nîşanî me dide. Li gorî daneyan bajarê ku ji 11,5 hektaran pêk tê heye. Li beja jêr nikarin lêkolînan bikin. Tenê li milê jor lêkolîn tê kirin. Li vê derê şopên serdema Îslamî, Bizans, Helenist, Îranî û Hititê xuya dibe. 8 kilometre dûrî bajarê Efrînê ye. Di sala 1956'an de ji aliyê heyetek Sûriye ve li vir lêkolîn hatin kirin.

Girê Eyn Dara ji du beşan pêk tê. Beyek nizm e. Bilindahiya wî 11,5 hektar e. Bajarê kevn, wekî bajarê jêr li vir hatiye avakirin. Beşa duyemîn bilind e. Li vir perestgeh heye. Lêkolîn li beja jor hatine kirin û rastî gelek berhemên dîrokî hatine. Berhemên ku hatin dîtin aydî serdema Hurrî, Hitit, Îslamî, Bizans û Îranê ne.

Li vir perçeyên seramik, sênîkên biçûk, perçeyên cam, pêlîstokên xaç û seramik û gelek amûr hene. Li ser pêlîstokên Seramik figurên xwedavendan heye. Xwedavend bi du destên xwe bi sînga xwe girtiye. Porê wê bi ser ruyê wê de dirêj bûye. Xwedavend li ser pêlîstokek din jî heye. Kulîlka Lotusê li ser sînga wê ye.

DI KETINA PERESTGEHÊ DE ŞOPA PIYAN HEYE

Gelek pêlîstokên din jî li vir hene. Lê ji ber ku hin beşên van pêlîstokan tune baş nayê tarif kirin. Tê gotin ku li ser piştê hesp şervanek heye. Dîtina herî muhîm perestgeh e. Wekî avahiya perestgehê avahiyek din heye. Ev balê dikişîne ser xwe. Dîroka vir heta sedsala 10'an a Beriya Zayînê (B.Z.) dirêj dibe. Lê tê gotin ku dîroka wê hêj kûrtir e. Li gorî lêkolînan ji kevîrê reş ê bazalt û kireç cihê ku mezinbûna wê 32×38 metre ye hatiye çêkirin. Di destpêka ketinê de şopê diçe ber deriyê perestgehê. Şopa milê mirovan li ber derî xuya dibe. Di gava duyemîn de milê çepê jî milê din mezintir e. Ev yek balê dikişîne ser xwe. Tê gotin ku ev nîşan dide ku dê kijan pî berê têkeve perestgehê û wekî sembol nîşan daye. Li piştê wê holek heye. Li wir deriyê duyemîn heye. Li ser milê rastê îbadetxane heye. Beşa Koridorê jî bakur, başûr û rojava heye.

Li ser dîwaran jî peykerên Sfenks û şêran hene. Bi awayekî hûrgiliyane hatine çêkirin. Her wiha nexşên îbadetxaneyan jî bi terhe xwedawenda Çiya hatine çêkirin. Têkildarî vê çîrokên xwedawendan û sewalan di xwe de dihebîne. Tê zanîn Sfenks û şêr heywanên Îştare ne û xwedawenda çiya jî alîkariya wan kiriye. Ji ber vê mihtemel e perestgeh jî bo Îştare hatiye çêkirin. Li vir tabloyek hatiye dîtin û li wir Îştare wekî şervan hatiye tarîfkirin. Di dest Îştare de çek heye û di nav kincên rengorengo de hatiye nîşandan. Li ser milê wê yê çepê tîr û kevan hene. Her wiha qismek ser çavê Îştare jî li ser kevîrê bazaltî hatiye dîtin.

CINDIRÊSE: JIN DIRÊSE

Navçeya Cindirêse ku bi navê xwe jî balê dikêşe, gelek şopên çanda Til Xelefê yanî şopên şoreşa yekemîn a jinê, şoreşa çandinî-gundîtiyê di xwe de dihebîne. Her çî qas bê gotin navê wê Jan Darîûs jî navê fermanîromayî tê jî, lê di vî warî de bi awayekî herî sade dayikekek ku şopên erdnîgarî û çandiniya xwe parastîye vegotîye. Dayik diyar dike ku peyva "cin" di kirmanckî de tê wateya jinê û peyva "dirêse" jî rêsandinê tê û tê wateya hilberandinê. Di vê çarçoveyê de dema em lêkolîn dikin peyva "cin"ê heta Hûriyan jî diçe. Di hûrtiyê de "cin" tê wateya jinê. Dirêse jî tê wateya hilberandinê. Her wiha di kurdî de "rist" kesk û hilberîn e. Li gor vegotina wê dayikê wateya Cindirêse tê wateya hilberandina jinê. Her wiha têgotin ku li Cindirêse mirovên dîmirin li Girê Cindirêse dihatin binaxkirin û li cem wan teşiyek jî dihat binaxkirin. Ev yek wateyeke din li peyva "dirêse"yê bar dike û her wiha diyar dibe ku di baweriyên nedewletbûyî de baweriyên jiyana piştî mirinê dewam kiriye û bi navê mirinê tiştek tune ye. Yanî mirî jiyane didomînin.

LI CINDIRÊSE BANDORA ÇANDA TIL XELEFÊ

Di vî warî de der barê çanda xwedawendiyê daneyên girîng hene. Li biniya girê Cindirêsê du girên girîng hene. Her wiha aîdî serdema bronzê koşkek heye. Taybetmendiyêke din jî ew e ku Cindirêsê dişibe Kînalva paytexta Hîtîyan. Li gor vegotinên dîrokzanên asûrî, ev der di heman demê de wekî paytexta Hîtîyan ku ji Qargamişê hatiye û seranserê Çemê Firatê ye, tev geriyaye. Di lêkolînên ku alman û sûriyeyan li Girê Cindirêsê kirine de, şopên çanda Til Xelefê tên dîtin. Li cihekê ku Rojhilatê Firatê û Anatolyayê bi hev ve girêde. Li vir şopên çanda xwedawendiyê tên dîtin. Li biniya vî girî du îbadetxane hene. Her wiha aîdî serdema bronzê koşkek jî heye. Ji berhemên li vir tên dîtin diyar dibe ku dîroka Cindirêsê heta çanda Til Xelefê diçe. Her wiha berhemên aîdî Bîzans, Roma, Helenîst, Asûr û Hîtîtan jî hatine dîtin.

NEBÎ HORÎ: SÎROS AN QOROŞ

Li navçeya Bilbilê, li Keleha Nebî Horî ku jê re Nebî Horî (Neviyên Horiyan) jî tê gotin, yek ji wan cihên herî kevn e. Tê diyarkirin ku Nebî Horî yek ji wna bajarên herî girîng ên neviyên Hûriyan e. Peyva Hûrî jî ji "Ûr", "Ar" an jî "Ariyan" pêk tê. Li rojhilatê bakurê Efrînê ye. Ji navê xwe jî diyar e ku wekî wargeheke Hûriyan e. Cihekî stratejîk e. Piştî Mîladê, romayîyan li vir cihên xwe yên leşkerî ava kirine. Her wiha li vir îbadetgeh, şanoyên antîk, gelek mal, bircên pîramîdan, goristan û pirên aîdî romayîyan hene. Cihwareke dîrokî ye û li ber Ava Efrînê ye. Di qeydan de jî derbas dibe ku şanoya antîk a li vir piştî şanoya Afamiyayê şanoye herî mezin e.

Di sala 1964'an de heyeteke fransewî li vir lêkolîn kirine. Lê belê bi vegotinên ku bi temamî ji çanda gelê herêmê ye hatiye vegotin. Ji bo Nebî Horî tê diyarkirin ku femandarekî romayî yê bi navê Seloqîs ev der ava kiriye. Tê diyarkirin ku bi hatina Îskenderê Makedonî, ev der B.M. 280-312'an d ehatiye avakirin û heta serdema Îslamê jî di dest Îskenderê Makedonî de bûye. Cihekî stratejîk e û di nav Mezopotamyay Jorîn û Antaqyayê de ye. Romayîyan li vir baregeheke leşkerî ava kiriye. Her wiha tê gotin ku di dema Justiniyasona de jî veguheriya cihekî hacê. Paşê bi navê Ajîyapolis an jî wekî cihekî pîroz di qeydan de cih girtiye.

'PARASTÎNA EFRÎNÊ PARASTÎNA ŞOREŞA JÎNÊ YE'

Şopên Hurrî, Hîtît, Roma, Bîzans û Osmaniyan ên li ser axa Efrînê xuya dibin, nîşan dide ku şaristaniyên dewletî her serdemê êrîşî vê axê kirine. Lê di milê civakîbûnê de bawerî, rituel, sembol, çîrok û teknikên neolitik nîşan didin ku Efrînê tevî hemû êrîşan cewherê xwe parastiye û heta îro hatiye. Cewher û ruyê dîrokî û civakî yê berxwedana Efrînê xwe dispêrê, îspat dike ku serdema şaristaniya demokratîk, serdema şaristaniya jinê ye.

Efrîn, ji hemû jinên cîhanê re bi wesîleya 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê peyama "Ji bo Efrîn rabin ser piyan" dide. Ev peyama di vê wateyê de pir girîng e. Efrîn niha bi dirûşmeya "Parastina Efrînê parastina şoreşa jinê ye" bang li hemû jinên cîhanê dike. Efrîn, bi berxwedana xwe, deşîfre dike ku agahiyên di hafizaya şaristaniya dewletî de cih digire, dijminê jinê ye. Efrîn ku di nava xwe de gelek daneyên rûyê civakî û dirokî yên xwe dispêre şaristaniya demokratîk, diparêze, 37 rojin li dijî duyemin arteşa mezin a NATO, berxwedanek bêhempa nîşan dide. Efrîn, di şexsê Avesta Xabûr û Barîn Kobanê yên pêşengiya vê berxwedanê kirin de, îspat kir ku bajarê Jinê ye û dê wekî bajarê jinê bê bibîranîn. Ev yek ne tesadufî ye. Avesta Xabûr û Barîn Kobanê jî, wekî Arîn Mîrkan a nav li Berxwedana Kobanê kir, hem bûn navên sembol û remz. Hem jî manifestoya berxwedanê nivîsandin. Bi vê çalakiya xwe ev berxwedan ji hemû cîhanê re vegot.

Gelê Efrînê nîşanî cîhanê da ku şerê li vir tê meşandin şerê navbera paradîgmayan e. Girînge ku mirov vî şerê pergala a bi rêbaza gelê Efrînê kodên dirokî û civakî ji rastiya rêbaza jinê girtiye bi wate bike. Li ser vê xetê, heqîqeta bi berxwedana Efrîne derketiye holê, nîşan dide ku Bajarê Efrînê bajarê jinê ye. Analîzên civakî yên di şexsê Efrînê de tên kirin, Ji bo Şoreşa Rojava ku wekî Şoreşa Jinê jî tê zanîn rast bê kirin rê û rêbazê nîşani me dide. Ji bo em civakê fam bikin, berxwedana ku xwe dispêre kodên civakî û dîrokê, rêbaza ku dîrok "Di îro de veşarî ye" xurt dike. Ji ber vê yekê ji îro de hemû şaristaniyên demokratîk piştgiriyê dide berxwedana Efrînê.

Dîsa berxwedana Efrînê hem ji bo kurdan hem ji bo ji bo yekîtiya neteweyî girîng e. Bi vê berxwedane deriyê xwe li yekîtiya neteweyî vedike. Dîsa ev berxwedan vîna civakê bi cîhanê dide naskirin. Nîşan dide ku vîna civakê ji hêza duyemîn a cîhanê xurttir e. Efrîn ku şopa jin, bawerî, mezhep û gelên cuda di nava xwe de vedihewîne, di vê wateyê de ji bo hêzên şaristaniyên demokratîk dibe hêz û hevîyek mezin.

ÎSPAT KIR KU DIKARE BI BERXWEDANÊ CEWHERÊ XWE BIPARÊZE

Li Efrîna ku bandora çanda neolotîk hêj lê zindî ye û xwedi dîroka hezaran salan e; hişmendiya berxwedanê, hezkirina axê, heza welatparêziyê, vîna cewherî, rêxistinbûn bi rêbazên têkoşîn û estetîk jîn dibe û bi ruh dibe. Ev berxwedan nûnertiya rastiya rêgezên bîrdoziya azadiya jinê ku kêlî bi kêlî dixê meriyetê û jîndar dike ye. Erdnîgariya Efrînê kodên vê berxwedanê li ser xwe dipareze. Zêdebûna Şikeftan, çiyayên bilind, warên dirokî, heza dîroka jinê nîşan dide. Dîsa Wateya ku di navê gundan de hatiye veşartin, teknikên neolitik, warên dirokî yên xam, li benda lêklînê ye. Şopên Hurrî, Hîtît, Roma, Bîzans û Osmaniyan ên li ser axa Efrînê xuya dibin, nîşan dide ku şaristaniyên dewletî her sendemê êrîşî vê axê kirine. Lê di milê civakîbûnê de bawerî, rituel, sembol, çîrok û teknîkên neolitik nîşan didin ku Efrînê tevî hemû êrîşan cewherê xwe parastîye û heta îro hatiye.

ÊRÎŞA LI DIJÎ EYN DARA PÊK HAT DAXWAZA TUNEKIRINA DÎROKA JINÊ YE

Stargeha Eyn dara ku dîroka wê heta 3 hezar sal berê dirêj dibe, di 26'ê Çile de rastî êrîşa bombeyî ya TSK'ê hat. Pir aşkere ye bi vê yekê xwestin berhem û çanda jinê tune bikin. Li van girên ku peykerên Îştare heye, disa peykerên şêran jî lê heye. Dîsa li jêra gir jî gelek peykerên din jî hene.

WARÊ BAWERÎ Û GELAN

Li hemû warên dîroki yên Efrînê şop û remzên Êzidiyatiye heye. Dîsa şopa kevneşopiyên wan hene. Li warên dîrokî yên Çil Kanî, Çilxane, Çilmêra, vê rastiye îspat dike. Wateya Çil pêvajoya "Hebûnê" vedibêje. Ev jî nîşan dide ku li ser vê axê her dem lêgerîna heqîqetê zindî ye.

Dîsa li vir remzên zimbilê genim, glover, xaç, balêdikişîne ser xwe. Dîsa li navçeya Mabeta ku remz û çanda elewtiyê derdikeve pêş, girîng e ku baweriya xwe bi Dad Fatma bînin. Ji Dad Fatma heta Nuri Dersimî hemû mezikên elewiyan wekî efsane tê nîşandan. Baweriya elewiyan a li nîrxên civaka ahlaki û politîk xwedî derdikeve û li gorî wê dijî li navçeya Mabeta hêj zindî ye. Malbatek Ermenî jî bimine, çîrokên der barê ermeniyan de tînin gotin, nîşan dide ku çiqas wê çandê diparêzin. Dîsa balkêşe ku fêrbûna zaravayên Kirmanckî û Soranî wekî tarza jiyane esas digirin.

BI ÇANDA DEVKÎ DI BER XWE DIDIN

Gelê Efrînê ku bi çanda devkî xwe diparêze, li hemû malbatê hunera destan pêşketî ye. Di her malê de sinhetkarek heye. Di her malê de hunermend û ressamek heye. Çîrokpêj û dengbêjek heye. Perwerdekirina zarokan a di qadên huner û sinhetkariyê de tarzek jiyânê ye. Gelek tevn û dezgeh hene. Hûnandin, ristin, neqîşandin û gelek cureyên tevn û neqîşan li vir pir pêşketî û zindî ye. Ev huner bi awayekî zindî xwe diparêze. Nirxên estetîk yên di meheke de piştî berxwedana li Efrînê derketin holê yên wekî afirandinên hunerî, stran, helbest, xêzkirina resîman, hêza çanda devkî nîşan dide. Disa hêza hêvî û hêza hestê nîşan dide.

GIRÊDANA AXÊ TARZA JIYANÊ YE

Yek ji taybetmendiyên şaristaniya jinê girêdana jinê ya bi axê re ye. Di bîrdoziya rizgariya jinê de yek ji rêgezên sereke welatparêzî bi vê yekê ve girêdayî ye. Li Efrînê girêdana bi ax û xwezayê re pir bi hêz e. Li vir her malbat karê çandiniyê dike û bi axê ve grêdayî ye. Li ber her malê dar û ber heye. Bêyî daran jiyân nayê fikirîn.

XWEMALIYA ŞAXA ZEYTÛNÊ LIBERXWEDAYÎN E

Zeytûn di her kêliyên wan ên jiyânê de cih digire. Sedema vê jî têkiliya navbera hêza hilberînê û terhê jiyana wan e. Li hemberî hilberîn û jiyana modernîteya kapîtalîst ku hewl dide wan ji hev veqetîne, balê dikêşe ser yekîtiya jiyân û kedê. Bi bîrbiriya warê ku cara ewil zeytûn lê çê bûye, peyameke estetîk, jiyaneke azad dide cîhanê. Şaxên zeytûnê tên wateya xelatê û bereksê dewleta tirk ku dixwaze vê yekê veguherîne qirkirinê, bi van şaxan dixwazin mizgîniya serketinê bidin hêzên şaristaniya demokratîk. Li hemberî netew dewletên modernîteya kapîtalîst ku dixwazin şaxê zeytûnê reş bikin, tê wateya liberxwedayîna li hemberî vê ferasetê. Di hemû kar û barên xwe de, diyar dikin ew ê nehêlin zaytûn bê reşkirin. Bi feraseta xwe derseke mezin didin kesên zeytûnan texrîb dikin û zeytê didizin. Her wiha bi awayekî hêzdar feraseta ku mirîşkan didizin deşîfre dikin.

Jinên ku bi destên xwe yên şîfayî birînên ji şer dicebirînin, bi zanyariyên xwe yên di warê tîba xwezayî de jî balê dikiêşin. Jinên ku bi rêbazên tîba xwezayî li şîfayê digerin, dizanin kîjan giya bi kêrî çî tê. Jin bi vî awayî ji bo gelek nexweşînan li dermanan digerin û beriya her tiştî yekîtiya bi xwezayê, jiyana tenduristiyî esas digirin. Bi feraseta ku nexweş nekevin an jî dema nexweş bikevin dizanin ku kîjan tişt derman e tev digerin. Di amadekarina van dermanan de şopên çanda neolîtîkê tên dîtin. Li gelek deverên Kurdistanê têkildarî vî rewşê tişt hene.

Li Efrîna ku bi awayekî zêde tesîrên rejîma Baasê jî xwe lê dane der, ji destpêka têkoşîna azadiyê ve tişta balê dikişîne jinên ku tev li têkoşînê bûne. Tevî ku bandora kapîtalîzmê hebe jî, her hefte roja înan diçin gundê xwe û li wir bêhna xwe vedidin. Di demên kurdî hatibû qedexekirin û axaftina bi erebî şertek mecbûrî bû de jî bîadî vê yekê nedihat kirin. Jinên bi navê Seyran, Fîdan, Ezîme, Sozda û Rukên ên tev li têkoşîna azadiyê bûn, bû sedem ku gelê herêmê ji bo azadiyê tev bigere. Her wiha rejîm jî bi zext û zorî zaf bi ser jinan de çû. Her wiha ji bo bişavtin bê xurtkirin rejîma Baasê li vir rêxistineke bi navê îtîhad Elnîseyî (Yekîtiya Jinan) ava kir û ev yek jî nîşan dide ku ka çi qasî hay ji hêza jinê heye. Ji ber ev rêxistin di nav vê civakê de çê nebû, di demeke kurt de ji holê rabû.

PIŞTÎ KOBANIYÊ BAJARÊ DUYEM E KU AZADIYA XWE ÎLAN KIR

Di Şoreşa Rojavayê de piştî Kobaniyê bajarê duyemîn Efrîn e ku azadiya xwe îlan kir û li hemberî rejîma Baasê ket nava rêxistinbûyîneke hêzdar. Di destpêka şoreşê de bi pêşengiya jinan meş hatin lidarxistin, çalakî hatin çêkirin û bi vî awayî bersiveke ku bi hezaran salan bi hesreta wê bûn dan. Bi taybetî jî bi pêşengiya jinên Mabetayê çalakî bal kişandin. Piştî tabûra Şehîd Rûken hat avakirin, jin bêtir tev li nav şoreşê bûn. Ê şehîda yekem a Rojavayê Slava jî di vê berxwedanê de cihê xwe girt.

Di destpêka têkoşîna azadiyê de jinên ku li mal û kuçeyan dest bi rêxistinbûyîne kirin, bi şoreşa Rojavayê re li akademî, meclîs, komun û kooperatîfan dest bi rêxistinbûyîne kirin. Ê şoreşa Rojavayê kirin şoreşa jinan. Bi pêşengiya jinan manifestoya berxwedanê nivîsandin. Nîşan dan ku hêza sereke ya netewa demokratîk û pergala modernîteya demokratîk a jina azad in.

Berxwedana li Efrînê ku bi heqîqetê çandê hêzdar di xwe de dihebîne, di vî warî de gelekî watedar e. Ew xwemaliya ku bi pêşengiya Avesta Xabûrê derket holê, xwemaliya Efrînê nîşan dide. Wê riya sereke ya hêza vê xwemaliyê bi munasebeta 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê, li hemberî feraseta mêrî ya dixwaze xwemaliya jiyane bigihê hemû jinan, feraseta modernîteya demokratîk bigihîne hemû cîhanê. Çimkî; "Serdema şaristaniya demokratîk, serdema jinê ye."

Akademiya Jineolojî

Gulan 2018